XATIRXWESTIN

Ehmed Şêran

Ne wesaye xatirxwestin
Mirina dibite, mêhvana.
Giyanê gêncatiyê temen bar diket.
Ji warê dil û cergan bê metirsîn.
Xwezî û omêdan vedimirînin
Wekî kesera hêvîdariyên li meyxana
Bi şevên dirêj, dîwaran
bê xem dibin û mêjîkên wan, dibite
deşt û seyrana gurgên
birîndar, li nav da
dihête kirin
Ne wesaye xatirxwestin
Wekî ewrên bê baran
Ne buriskan, rondikan û
Ne, li geliyan
Zeng vedidin
Cotyaran dixapînin û
Belav dibin, da nemînit dilovanî
Wekî xeribiya bê akincîbûn
Mirov, neçar diket û rondikên çavan,
dilezînin bê rawestan.
Demên biçûkatî û
Yariyên zarokan,dibine
Xemla, şevên dijwar
Li nav tehlatiya.
Pirtûka bîrhatina
Ne wesaye xatirxwestin
Wekî payîza bê gelawêj
Ji rûbaran tore bibêt û
Nehilgirên xema.
Weşandina pelkên
Daran û kanîkên dilşikestî
Ne rewşe, ne arame
Dengê bilbilan û sirûda bayê
Hejar dibît wekî esmanê bê ronahî
Şevan reş diket û çirîskên sar û
stêrên melîl
Dever bi dever, digerin bê heyv
da bibite astengiya.
Evîna sozdaran û qedexekirina
hevdîtinan,
Dildarên li pişt pencera naskirî
Wekî ziman û dem û ewal
Pêkve bijîn, li ser bêbextiya,
çîrokên, bê hizir û bê raman û bê
nivîser.
Dahola derewan lê didet û li rexê
dî.
Govenda rû yê reşan û ezman
dirêjan
Dest pê diket
Wekî bajêrê bê padîşahe
Cade û gulan, berze dibin
Dibite hewse
Dibite qutabxana, bê yasa
Tê de radibin mirovxwar û leşfiroş
Satorên li ser stoyên
Malwêrana bilindkirî û babelîska
birsîtiyê, dibite efsera xwekujîn
Ger te bivêt xatirxwestin hilke,
şemalkên.
Wexir û rêvinga
Çavan bi kilê hevaliniyê û
Azadkirina wê gerdenê.
Ciwan bike û bigirnije
Dabibite keniya, bê guneha
wesa dibite rêka dirist
Da bibite xatirxwestin